


Rola wergêrê di rûniştina ziman û edebê netewî de



Konê Reş

Bêguman rola wergêrê di pêşketin û rûniştina zimanê netewî de zor mezine. Nexasim sebareti me Kurdan ku zimanê me qedexeye; nivîsîna bi zimanê me qedexeye.. Û pêşketina ziman, bi xwendin, nivîsîn û bikarînanana wî zimanî ye...

Di rewşa me Kurdan de, pêwîste em berê pêşî, folklorê xwe, bi tev cureyên folklor ve berhev bikin, xwendin û nivîsîna bi zimanê Kurdî di nav gel de belav bikin. Di pey re û berê pêşî, ji zimanê biyaniyan wergêrînin bo zimanê Kurdî û wiha pertukxaneya xwe ya bi zimanê kurdî ava bikin... Berê duwem ku em berhemên afirêner,



yên bijartî ku bi zimanê kurdî hatine nivîsîn, wergêrînin bo zimanê biyaniyan.. Erê, pêdiviyê ku, em di destpêkê de pertukxaneya xwe, bi zimanê xwe dewlemend bikin da ku em karibin ji wê pertukxaneyê xebe bidin.. Eger em li zimanê xwe xwedî dernekevin, wergêr nikare tiştêkî ji me re bike.. Mane Kurdan ji mêj ve gotiye: Etar ji tûrikê xwe xeber dide...

Va careke din em li nîrê zêrîn; li mîr Celadet Bedirxan û kovara wî HAWAR-ê vedigerin.. Belê, dema ku wî û hevalên xwe ew kovar bi berhemên wergêrandî dixemilandin. Di43

baweriya min de hingê mîr Celadet xweş bîr dibir ku rola wergêrê di rûniştina zimanê netewî de gelekî mezine.. Wê didît ku dewlemendbûn û parastine ji zimanê Kurdî re.. Vêca, wî deriyê wergêrê bi berfirehî di kovarên xwe û yên birayê xwe Dr. Kamîran Bedirxan de vekiribû û bi zîrek bûn wî, birayê wî, Osman Sebrî, Qedrî Can berhemên wergêrandî bo zimanê kurdî di Hawar, Ronahî û Roja Nû de belav dikirin..

Roja îro pêdiviya me bi wergêrandina ji zimanê biyaniyan bo zimanê Kurdî bêtir heye ji wergêrandina ji zimanê Kurdî bo zimanê biyaniyan.. Jixwe xelkên me yên ku bi zimanê biyaniyan dinivîsin, têra xwe hene û têra xwe ziyar gîhandine zimanê me... Eger em li berhemên wan mêze bikin em ê bibînin ku wan gelek idyom û gotinên pêşyan ji zimanê Kurdî dizîne, bi rengêkî zîrek wergêrandine û di nav berhemên xwe de bi kar anîne û her çiqasî berhemên wan bi erebî, tirkî û farisî bin jî, lê her di bin bandora zimanê kurdî de ne, ji ber ku bi idyom û peyvên kurdî hatine xemilandin.. wiha jî nav û deng dane, mîna Selîm Berekat...

Heger Selîm Berekat bi Kurdî binivîsaba û ew idyom û peyvên pêşyan di berhemên xwe de bi kar bihanîba û di pey re berhemên wî bihatina wergêrandin bo zimanê biyaniyan, hingê wê dinyê û alemê ji zimanê me re li çepikan bide..

Vêca ez rûniştina ziman û edeba kurdî ya netewî di berê pêşî de, di nivîsandina bi zimanê kurdî de dibînim. Di pey re ku berhem ji zimanê biyaniyan bihêne wergêrandin bo zimanê kurdî û dawî ku em ji Kurdî wergêrin bo zimanê biyanî.. Di baweriya min de, wiha emê karibin zimanekî rûniştî ji netewiya Kurdî re peyda bikin ku di pêşerojan de zarokên me serê xwe pê bilind bikin.

